danûştandinê di navbera Şandeya Rêjîmê û Şandeya Rikberiyê li Cinêwê deşt pê bike, û deştpeka wê gerrê bi asta pêşketîna peyda kirina deverên aram û bêşer ve, girêdide. Ev yek diyar û tekez dike ku listîkvanên sereke di pîrsgirêka Sûrî de hîn li ser çareserkirina pîrsgirêka Sûrî negihane lihevhatînekê, û gelê Sûryê jî gihane wê baweriyê ku danûştandinê tene kirin tev de şanoyek e, mebest ew e ku kengî ew listîkvanên sereke (Emerîka - Rûsyayê) bighên lihevhatînekê de çareserî jî hesan bibe. -Di wê çarçûveyê de, tevgera siyasî ya Kurdî li Rojavayê Kurdistanê li kû ye? Gelo ji her guhertîneke ku bê kirin re xwe amade kiriye? Tu pirojeyên wê yê neteweyî Kurdî- niştîmanî Sûrî hene, bêtî ku ew pirojeyên ku li ser kaxezan hatîne nivîsandin, pirojeyekê ku hevalbend û piştgirê wê hebin? -Raşt e ku li ser asta cihanê hatiye naskirin ku Kurd di çarçûveya Hevpeymanîya Navdewletî ku Hêzên Sûryaya Demuqratî ku Yekîneyên Parastîna Gel YPG'ê beşekî sereke ne tê de, li Sûryê bûne beşekî sereke di şerê cihanî yê li dijî terorê de, lê gelo li ser asta siyasî tu gerantî piştî tûkçûkirina Rêxistîna DA'ÎŞê heye? Rêveberîya Xweser di warê peydekirina gerantiyê de bi ser ne-



Ebduselam Xoce

ket, tevî ku bi hevpeymanîyê xwe re dilsoz bû (Reqa û Gundewarê wê) wek nimûne, û Encûmena Niştîmanî a Kurdî li Sûryê ne di wê astê de bû û ne di wê astê de ye ku karibe tu gavan der barê ferzkirina xwe li Rojava wekî kiyaneki Kurdî Sûrî serbixwe bavêje, û Hevberîya Niştîmanî a Kurdî hîn û hîn di wê navberê de maye û hewil dide ku zemînekê ji biryareke Kurdî ya serbixwe ji Kurden Sûryê re peyda bike. Rizgarkirina paytêxa Rêxistîna DA'ÎŞê wekî ku hatiye binavkirin tûkçûyê, û gavên bi lez di rewşa Sûrî de tî avêtin, pêwîst e ku aliyên siyasî yê Kurdî li Rojavayê Kurdistanê nakokiyên xwe deynin aliyekî, li ser maseyêkê li hev bicivin û nexşerêyêkê ji çarenivîs û paşerojava xwe û Rojavayê Kurdistanê re deynin, ger ev yek nebe firseteke zêrîn dê ji deştên Kurdan bibe.



# Xalis Misewer Rexnevan û Hevserokê Yekîtiya Reşwenbîrên Kantona Cizîrê:

## Kesê rexnevan bike jî divê ku mirovekî hunerbaz û zana be

- Gelek nivîskarên Kurd ji ber rexneyê ji min xeyidîne û hew bi min re diaxivin.
- Wêjevanê ku bêje şaşîtiyên min tune ne, ew wêjevanekî lawaz e.
- Rexnevan pêwîstiya wî bi hemî zaniştan heye.
- Dema ku helbestvanên me dikevin di wêneyên helbestî de jî, wêneyekî kirêt didin

Hevpeyvîn: Ferîd Mîtanî

**-Wekî têrm an tîgîn, di kûrahiya xwe de rexne tê çi wateyê?**

Rexne wekî parzûnê ye, tiştên baş û nebaş ji hev vediqetîne, ev e rexne.

Anku çawa? Helbesteke lawaz û yeke xurt hebe, divê ku tu derxî kîjan lawz e û kîjan xurt e, û ji ber çi? Bi giştî ew e rola rexneyê.

Pêwîstiya nivîskar gelekî bi rexneyê heye, nemaze nivîskarên Kurd, ji ber em hîn di helbestê de nû ne. Rast e helbestvanên me hene û hin ji wan asta wan baş e, lê bi rengekî giştî negihaye asta ku em dixwazin.

Rexnevanên me yên Kurdan jî kêman, û hêvî jî ew e ku nivîskar rexneyên rexnevanan bipejirîne, ji ber rexnevan ne dijmînê nivîskaran e. Rexnevan dostê her kesî ye, li rastî û başiye digere.

Kesê ku bibêje pêwîstiya min bi rexnevanan nîn e, tu di cî de dikarî bibêji ew nivîskar bi pêş nakeve.

Rexne roleke xwe ya gelekî girîng di warê wêneyê de heye.

**-Her çî qas rexne ji hemî aliyên xwe ve şax û şopeke zor û asteng e, lê te rêya rexneyê bijart, sedema bijartina te jê re çi ye?**

Rexne hunereke gelekî xweş e. Ji ber ku kar û ezmûneke kesayetî ye. Dema tu têklistekî didanî ber xwe û tu lê dinihêrî ka çî tê de heye, li vir tu afirandinekê dikî û karekî dikî ku tu kesî nekirîye.

Her kes nikare rexneyê bike, kesê ku behreya wî tune be, qet nikare rexneyê bike. Ez dikarim bêjim nêvî xwendin e û nivê din jî behre ye.

Kêfa min ji rexneyê re hat, ji ber ku rexne pîvanek e ji karînen mirov re. Tu li helbestekî dinihêrî û tu dadihûrîni, tiştêkî gelekî xweş e.

Çawa mirovê biroji bi banga Mexrebê sa dibe, wiha rexnevan jî, dema nivîsa xwe ya rexneyê bi dawî dike, çêja serkeftinê heşt dike.

**-Divê ku çî li rex mirov peyda bibe ta ku bibe rexnevan?**

Bi rastî pirseke girîng e. Rexnevan pêwîstiya xwe bi hemî zaniştan heye. Rexnevanê ku ji hemî zaniştan ne têgihîştî be, ew ne rexnevan e.

Divê ku rexnevan mîtyolocya, dîrok, efsane, destane, kîmya, û fizyayê zanibe, û eger nizaniye ez dikarim bibêjim ew ne rexnevan e.

Ji ber çî ez wilê dibêjim? Ji ber mînaka herî nêzîk bi-wêjên Kurdan e, eger tu tê de ne li pêş bî, tu yê ji wateyê tînegihîji. Rexnevan ta di bîrkarî de jî divê ku zana be. Her tiştî bixwîne, di her tiştî de xwe li pêx bixe û paşê rexneyê bike.

**-Tu çawa û kengê bi ser şopa rexneyê ve bûyî?**

Min gelek guhdan bi zimanê Erebi dikir, ji refa 6'an ve kêfa min ji zimanê Erebi re dihat. Min ji xwe re dironame ji Qamişlo tanîn û dixwendin.

Paşê min elfabeyê Kurdî jî peyda kir û bi awayekî jixweber hîni Kurdî bûm.

Ez dikarim bibêjim ku sala yekê ji zanaingehê min dest bi rexneyê kir, ez bawer im di sala 1977'an de bû.

Min gelek rexne nivîsîn, lê tu der nebû ku ez lê biweşinim.

Ta vê gavê jî li rex min in.

Min wê demê hemî pirtûk û gotarên rexneyî dixwendin.

Hingê bernameya Şaîr Eleber li ser kenala Elmesteqila der diket, tu kes li berê nedima ji ber ku bernameyêke zuha bû, lê ez bi kîfxweşî li bendê dimam û min jî ji cem xwe ve helbestvan dinirxand û pile didayê.

Vê dawiyê min rexneyek li ser berhema Ebdulwehab Elbeyatî weşand, Sena Elşiîlan heye dosta Kurdan e, 50 xelatên rexneyî û wêneyî wer girtine û doktora di rexneya wêneyî de sitandiye, ji min re peydam avêt û sond da ber min ku ez berhemen wê rexne bikim. Sena Elşiîlan berhemen xwe ji Urîdînê jî min re bi rê kirin û min nivîsek bi qasî 12 pelan rexneyek li ser berhemen wê çê kir. Ji min re got ku 100 nivîskarên Ereban nivîsên min rexne kirine, lê ne bi zanebûna te. Gava ew yek bi min re çêbû, ez gelekî kîfxweş bûm û bawerîya min bi min mezin bû.

**-Her çî qas rexne navgîna lipêşxistinê nivîs û nivîskar e jî, lê li gorî ku diyar e, nivîskarê Kurd rexnevan napejirîne û jê dengije, hûn çawa ji vê yekê nîzîk dibî?**

Ev astengiyek e, yan jî nexweşiyeke e û hîn dermanê wê tune ye.

Ev yek jî dihêle ku wêjevanê Kurd lawaz bimîne. Nivîskarê Kurd rexneyê napejirîne û dibîne ku kesayeta wî dişike, ez jî her timî dibêjim kesayeta te naşike, eger helbestekî bişike nabe sedem ku nivîskarekî têk biçê.

Nivîskarê me nû ye û bawerîya wî bi kesayeta wî nayê. Ibrahîm Elxîrîst heye ji Dêra Zorê ye min rexneyek jê re çê kir, hat Qamişlo û sipasiya min kir.

Rexnevan rêberêkî wêneyî ye.

Gelek nivîskarên Kurd ji ber rexneyê ji min xeyidîne û hew bi min re diaxivin. Hinan telefona min jî kirîye û xwe gelekî hêrs kirine.

Wêjevanê ku bêje şaşîtiyên min tune ne, ew wêjevanekî lawaz e.

Dijmînên rexnevan gelekî çê dibin.

**-Rexne li nêv Kurdan ji dayîk bûye yan na?**

Rexne di nav Kurdan de heye, lê gelekî lawaz e. Li bakurê Kurdistanê jî lawaz e, lê li başûrê Kurdistanê ta astekî baş e.

Ji ber çî li rex me lawaz e, ji ber nepejirandinek ji hêla nivîskaran ve heye.

Kesê rexnevan bike jî divê ku mirovekî hunerbaz û zana be, ji ber eger tu di rexneya xwe de şaşîtiyêkî biki, te nivîskar kuşt!

Aniha ez rexneya li ser rexneyê çê dikim.

Lê helbestvanê me Kurdan helbestên wan ne zehmet in, ji ber helbestên wan ji cureyê raporî û rasterast in. Anku gotinên normal in û dîr ji nîgaşê ne.

**-Hûn di rexneya xwe de, bi tenê giraniyê didin hevokazî û şaşîtiyên watenasî yan jî ji hemî aliyên rêzimanî ve hûn dadihûrînin?**

Em li ser her tiştî radiwestin, lê ya yekemîn em li ser şêwazê nivîsê bi giştî radiwestin, her wiha nîgaş, lipêşxistin û lipêşxistinê bêjeyê.

Em li ser wan xalan jî radiwestin ku nivîskar di nivîsên xwe de ji rastbîniyê piçêkî dîr dikeve, bi zanebûnê jî asta zimanê qalibî derdikeve û zimanekî nû diafirîne (Jê re Mîtalga dibêjin).

Hevokên wekî: Ez ji te hez dikim û lîvşkerî; her kesî gotiye. Xwe ji vê astê derxe.

Em li ser şaşîtiyên zimanî jî radiwestin, lê ne bi zêdebûn.

Mijarên nûjenî û bikarnîna efsaneyê jî em xweş li serê disekin, lê nivîskarên me efsaneyê bi kar nayîn.

Min digot ez ê rojekê der barê "Efsaneyê di helbestê" de semînerêkê ji nivîskaran re çêkim, lê dibe hin li xwe

daneîn.

Bedir Şakir Elseyab di malikeke xwe de dibêje: Mirina min serkeftin e.

Çawa mirin serkeftin e?

Mebesta Elseyab ji vê malikê Xwedawendê Temûz ê Iraqîyan e. Ji ber ew Xwedawend zivistanê dimire û di buharê de car dî radibe.

Kurdan hîn ev tişt bi kar neati niye.

**-Tu xudanê serbihurî û heçaneke dirêj î, di nivîsên Kurdî de, herî zêde tu li çî şaşîtiyê rast tê, anku şaşîtiyêke beloq ku her kes dikeviyê?**

Şaşîtiya ku herî zêde ez lê rast tîm, bikaranîna peyvê ne di cihê xwe de, ev şaşîtiya herî belav e. Anku peywira peyvê nadinê, û carinan ew yek jî dibe pêkenok, ji ber wateyêke nexweş dide risteyê.

Şaşîtiya din jî dema ku helbestvan wêneyên helbestî didin. Helbest tev de wêneyê. Lê dema ku helbestvanên me dikevin di wêneyên helbestî de jî, wêneyekî kirêt didin. Anku mafê wê nadinê.

Şaşîtiyên zimanî jî li helbestên wan pir in.

Jixwe ji milê nûjenî û nîgaşê ve jî helbestên wan zuha ne.

Derbarê nûjeniyê, carekê min rexne li Seydayê Cegerxwîn jî kir.

Ji ber malikên xwe malik bi malik li bin hev rêz kiribûn, anku ew nûjenî ye.

Lê naveroka helbestên Cegerxwîn klasîk û romansiyetê de hene.

Helbestvanê îro jî wê romansiyetê bêhay in.

Ez dikarim bibêjim bila nivîskarên me sê qatê bixwînin û qatekê binivîsin.

Gelek nivîskarên Ereban ên gewre ji min doz dikan ku ez berhemen wan rexne bikim, lê ez dibêjim wan ez hew ji Ereban re rexne dikim, ez ê jî Kurdan re rexne bikim; lê car dî ez newêrim, ji ber Kurdên me dilê xwe digirin.

**-Te helbestên nivîskarên hevdemên xwe, û yên Kevin jî xwendine, helbesta herî zêde kêfa te jê re hat û şaşîti lê nebû, ya kê ye?**

Helbestvanên me yên Kevin, bi rastî Melayê Cizîrî, Ehmedê Xanî, Feqehê Teyran û Elî Elherîrî şaşîti li nik wan tune ne. Ev girgirê helbestê ne.

Lê gelek caran min şaşîti li helbestên Hamid Bedîrxan didî. Tiştên Kevin di helbestên xwe de bi kar tanî.

Jixwe helbestvanên me yên nû, bê fihîti biaxive! Şaşîtiyên wan gelek in.

**-Li gorî te, helbesta Kurdî ya pexşan(Nûjen) gihaye çî astê?**

Helbesta Kurdî ya nûjen, hîn bi çarlepikan dimeşe. Helbestavên me helbestên nûjen çê dikin, lê gelo ew nûjeniya ku çê dikin nûjenî ye?

Ez ne ji tevan re dibêjim, hin bejnên bilind hene, lê mixa-



bin bi giştî lawaz in.

Em di civînê de bûn, ciwanmêrek axivî û di çavên min de gelekî mezin bû.

-Wî got gelî hevalan!

-Heta aniha min derew li we dikirin. Min helbesta nûjen nenivîsiye.

Got ez ê li helbesta klasîk vegerin.

Helbestvanên me gotinên biyan û hevokên ecêb bi kar tînin, da ku xwendevan wîna bibe.

Carekê Deham Ferso ji Ibrahîm Mehmed re got:

-Mamoste ez ji helbestên te fêhm nakim.

Ibrahîm gotiyê ez ji nuxbê re dinivîsim, ne ji yê wekî te re.

Hêla ku nema jê bipirse.

**-Dema Rizoyê Osê romana Bîra Qederê ya Mehmed Ozon rexne dikir, xuya dibû ku rexneya Rizo ji hinav û malzaroka çanda Kurdî ye, gelo rexneyêke xwerû ya Kurdî heye, yan me rexneya xwe ji gelên din girtiye?**

Rexneya Kurdî ya em dixwazin, hîn tune ye. Tu dikarî bibêji heye lê hîn rexnevanên me xwe li pêş nexisîte.

Dê rexneyêke Kurdî ya xwerû çê bibe.

Dilovaniya Xwedê li Rizo be. Wî xwe gelekî xwe li pêş xistibû, sinc û exlaqên wî bilind bûn.

Min jî rexneyek li ser Bîra Qederê çêkir, û şaşîtiyên ku Rizo destnîşan kiribûn, di cihê xwe de bûn.

Ozon dikeve di şaşîtiyan de, lê di nav Kurdan de kesekî li pêş bû.

**Wekî me berê got, pirî nivîskarên Kurd rexneyê napejirînin, carinan ji acizî te biryar daye ku tu hew rexneyê binivîsi?**

Na. Ez tu caran dest ji rexneyê bernadim. Rexne ketiyê di xwîna min de, lê min gotiyê ez rexneyê li nivîskarên qels û kêmbawer nakim.

Ez xwe danaxim wê astê ku rexneyê li yekî bikim û nepejirîne.

**Em werin li ser mijarên kîn, wijdan û hevseriyê, gelo pîvaneke yekser ji rexneyê re heye ku rexnevan jê neçe der?**

Belê, divê ku pîvan hebin. Divê

ku rexnevan dadmend be.

Aniha li ser asta cîhanê, şêwazekî nû ye rexnekirinê heye. Berhemekî ji yê rexnevan re tînin, ji bêyî ku navê nivîskarê berhemê bizane, dê berhema wî rexne bike. Da ku xwe ji mijarên kîn û nakokiyên kesayetî rizgar bike.

Yek ji pîvanan divê ku rexnevan ji nivîskar ne aciz be, û bi hûrgilî li ser têkistê raweste.

Divê ku rexnevan çend caran li rexneya xwe vegere.

**Tu hewldanên te hene ku tu zargotin û wêjeya devkî ya Kurdî bidî ber awira rexneyên xwe?**

Heta aniha ew neketiye ber rexneyê ye. Li gorî min, şaşîti di zargotina me de nîn in, ji ber tiştêkî jixweber û efewî ye. Rexneya kûr jê re navê, bi tenê mirov dikare nerînen xwe li serê bide.

**Em werin li ser berhemen te, çî berhemen te ta niha hene, tiştêkî berdest heye vê gavê?**

Berhemeke min a rexneyî çap bûye bi navê "Elayîd Min Elîh". Gelek xwend û pesnê wê dan, ji ber tiştêkî zaniştî û xweş tê de heye.

Piştî du rojan ez ê berhemeke lêkolînerî çap bikim, û dê 10 hejmar jê bikevin di pêşangeheke mezin de.

Berhemeka min a Kurdî heye bi navê « Nerîneke Rexnesazî » li ser helbestvanên Kurdan e. Ev berheme derdora 10 helbestvanan vedihewîne, ji Cegerxwîn bigire ta bi Konê Reş.

**Li gorî te, paşeroja rexneyê li devera me çî ye?**

Paşeroja rexneyê li nik me dê li pêş bikeve. Eger nivîskar û çîroknivîs razî bin an na, dê rexne li pêş bikeve ji ber behremend li nêv me hene. Ez geşbîn im ji vî aliyê ve.

**ew ,iştî?...Gotina dawî pend, metelok, angoraz, kevalên sipehî, destan û afsaneyên Kurdî lê peyda ji vî milî ve zuha dibin, an jî ji ne: xwe**

Sipasiya we dikim û serkeftinê dixwazim. Ez her amade me û hevîdar im hevdişinê me her berdevam bin.

## Hawarek Bo Ereben Reqayê

Tu kes li ser nasnameyê nekuştine, çi nasnameya neteweyî be, yan olî be yan jî ayînî be.

Ne dezgehên taybet, ne ji yên giştî nedizîne.

Avahîyeke niştimanî ya giştî wêran nekirine.

Tu kes ji bo berdêlekî nerevandine.

Destdêrjî li ser rumeta çi kesî nekirine, ji çi pêkhateyê be jî.

Dîroka xwe ya siyasî û hevdem bi tu revandin û şêlandina jîna jî çi pêkhatiyên be jî, tarî nekirine

Ne bankên niştimanî yên giştî, ne jî saziyên diravan ên taybet nedizîne.

Bêbextî li tu cînarên xwe nekirine... Mala tu mirovêkî, jî kîjan pêkhatyê be jî, tev nedane.

Çi kesê xwe li wan digire, lê xwedî derdikevin û wî diparêzin, û çavên xwe ji nêrîna wî ya siyasî, neteweya wî, ol û ayîna wî digirin.

Ger tu bêwar û derbeder bî, Kurd te bi cih dikin. Ger tu birçî bî, te bi xwarin dîkin

Ger tu bazdayî bî, te diparêzin

Ger tu birîndar bî, te derman dîkin.

Ger tu xwe li wan bigirî te dibexşînin... Ger tu bikevî, te hildigirin.

Navnişana dilsoziyê Kurd e. Navnişana fêrisiyê Kurd e. Navnişana merdiyê Kurd e. Û navnişana rumetê Kurd e Xudanê diline bihêz ku wekî polayê ne..

Xudanê sîngine fireh î pak in, ku cihê dijminê wan jî tê de heye..



**Mihemed Xanim**

Kurd dîlana kêfê li ser merşa gulên welat ên rengîn in, ji kîna xwe rizgar bibe, destê birayê xwe yê Kurd bigire û dakeve xeleda dilanê.

Ey mirovê gerdûnî, ji wî miletî netirse, yê ku awaz û sitranên wan ta di şînan de jî li dar in.

Gelê ku gotinên wî wekî tililîyan awaz in, û rengên cilên keçên wî di rengê gulên zeminê de ne, jê metirse.

Destê xwe dirêj bike û dest ji xewnên xwe yên nijadperestî berde... Destê xwe dirêj bike, metirse û wekî xweşî û zelaliya ava Feratê dakeve qada kêfê.

Destê xwe dirêj bike û dakeve qada dilanê.. Bi xurtî li daholê dikeve.. Zirne li pêşiya bizqê dide

Destê xwe dirêj bike, biraderê te yê kurd bendewar e... Û xak li benda te ye.

Werzê çînîna zeviyên kêf û evînê va ye dest pê bû.

De biçe govendê... Sergovendê bigire.

Û Wiha hat û wiha çû... Siyar hat û peya çû

**Wergera Ji Erebi: Bûyerpress**

## Pîvan û Rêbazên Wergerandinê

Çi welatê heyf, nikare bi tenê li ser çand û zinişta xwe bijî; da ku xwe bi pêş bixe, pêdiviya wî bi çand, zanist, wêje, hizir, dîrok û ramanên gel û welatên din heye; li vir rola wergerandinê der dikeve pêş, ji ber wergerandin çand, hizir û ramanên gel û şarestanîyan hevhez dike.

Di vê serdemê de, bi pêşketina zanistî û bi lezbûna pêşveçûn, vedîtina û dahênanan re, wergerandin xwe wekî pêwîstiyê serdemî ferz dike ku piraniya welatan girîngî û enerjîyê mezin didin, û karînen pir giran jê re peyda dikin, da ku xwe bigihînin pêşketinê zanistî, lê divê pê re jî nasnameya xwe ya çandî û hizirî biparêzin; tu kes nikare rola wergerandinê di vejînkirina jiyana zanistî, civakî û çandî de li gel neteweyên din înkâr bike, ew diyardeya ku rê ji şarestanîyê re vedike bo ku derbasî her welatêkî bibe.

Lewre jî rola wergêr ji rola nivîskar ne kêmtir e, hema di heman astê de ye, ew heman peywirê dilîze ku hizir û ramanên bigihîne xwendevan, lê bi kirasekî nû ku ji çand û civaka xwe re guncav be. Bo vê yekê jî gelek kes dibînin ku wergerandin huner e, hunereke xwe dispêre ser afrandin, hestên zimanî û karîna nêzîkirina çandên cuda.

Wergerandin pêvajoyêkî hizirî, hişmendî û zimanî ya pir aloz e, ku afirandin û xebateke duqat jê re divê.

Divê wergêr berhema ku dixwaze wergerîne bi kûrbûn bixwîne, dirûv û şêweya wê derbas bike û jî wate û

naveroka wê têbighêje, da ku karibe bi şêweyêkî hêsan û zelal wergerîne zimanê din; ev yek jî jêhatîyêkî hizirî û zimanî ya pir mezin dixwaze, lewre jî afrandin li vir tê xwestin. Wergêr, ê ku berhemê werdigerîne zimanekî ku hevoksazî û watenasiya wê cuda ne, jê tê xwestin ku berhemê hemû wate û nîşaneyên xwe ve were têgihîştin, û bi çarçoveya dîrokî û çandî ya zimanê din re jî guncav be; ev yek jî dîsa afrandinê dixwaze. Di vî barî de, di prosesa wergerandinê de, divê gelek xal li ber çavan bînin girtin wek:

Guhestina wateyê: Her wekî biwêj û gotinên pêşyan; li vir, wergerandina peyv bi peyv nayê xwestin, ji ber ew dîrî wateya resen dikeve yan jî carinan dijwateya wê dide; her wekî di zimanê Kurdî de yê ku bi dewlemendiya biwêjen xwe tê naskirin, heke em bixwazin wan biwêjan wergerînin zimanên din divê em dîrî wergera peyv bi peyv bikevin, di destpêkê de wateya wan nas bikin û biwêja wekhevê wê di zimanê din de derxin; mînak heke em bibêjin: “ Zînê agir diavêje devê xwe lê Ehmed jê bawer nake”, ev biwêj heke peyv bi peyv bê wergerandin ku “zînê agir xiste devê xwe”, di zimanên din de tu wateyê nade, lê heke li gorî wateya xwe bê wergerandin wê çaxê dê wateya “sondxwarina li hember tawanbariyêkê” bide.

Mînaheke din, heke em wê hevokê: “Ev keçik weke heyvê ye” peyv bi peyv wergerînin bo zimanê Fe-

rensî dê wê wateyê bide “Ev keçik ne jîr e/ Cette fille est comme la lune”, lê heke em li gorî wateya wê biçin dê hevok li gorî zimanê Ferensî weha be “Ev keçik bedew e/ Cette fille est très belle”. Mînaheke jî zimanê Ingilîzî jî, biwêjek bi ingilîzî heye dibêje: “It is raining cats and dogs” yanî heke dîsa em peyv bi peyv wergerînin Kurdî em ê bibêjin: “kûçik û bisik dibarin”, ev wergerandin tu wateya wê tune ye, lê heke em gotinên wê derbas bikin û wateya wê wergerînin dê hevok bi vî rengî be: “Baran pir xurt dibare”.

Demek, divê wergêr bine-saiyêke wî ya çandî û zanîyarî hebe, tenê zanîna zimanekî biyanî ne têrê ye, divê di çanda zimanê ku jê werdigerînene kûr û têgihîştî be û termên wê baş nas kiribe, da karibe hizrên nivîskar biguhezîne zimanê xwe bîyî ku tu wateyêkî cuda bide wê; em dikarin vê mijarê bi mînaheke din ji zimanê Erebi zelal bikin, dema ku bi Erebi dibêjin : “عاد بخفي حنين”, ev metaforê di çanda Erebi de pir tê bikaranîn û çirokek li peyî wê heye, heke me xwest em wê peyv bi peyv wergerînin, em ê bibêjin: “Ew bi pêlavên Hûneyen vejeriya”, dîsa jî ev hevok tu wateyê nade, lê heke me çanda Erebi baş xwendibe em ê nas bikin ku wateya wê hevokê ev e: “Ew dest vala vejeriya”.

Xala duyem ku divê li ber çavan bê girtin guhestina şewaza nivîsandinê (şewaza ku nivîskar pê dinivîse, biwêj, metaformînak, gotinên pêşyan,



**Cihan Xelil**

bedewiya ziman û ...hwêd bi awayekî ku wekhevê wê di çanda zimanê din de bê dayîn). Bi pêkanîna van xalan em ê karibin wergerêkê baş û bêsaftî bi dest bixin.

Wergerandin ne tenê çand û hizra gel dewlemend dike, lê ziman jî pê re dewlemend û vejîn dibe, ji ber wergêr neçar dibe lêgerîne bike, peyv û termên kevînan vejiñe yan jî hineke nû saz bike, bi vê yekê bêhesazî û watenasiya zimên jî bi pêş dikeve, lewre jî tê xwestin ku wergêr di bikaranîna ferhengan de pîspor û hosta be.

Li kêleka wê yekê jî, jê tê xwestin ku bêalî be û xwe neke nava nivîsê, tiştekî tê de neguherîne û zêde neke, yan jî bandora xwe bernde nava nivîsê, bi wateyêkî din divê xwedî helwest û exlaq be.

Lê pîrsa ku divê bê kirin, gelo wergerên ku gihastîne destên me heyana kîjan astê bêalî ne? Gelo wergêr karîbû mebest û hizrên nivîskar ji sedî sed bigihîne me? Her wergêrek li gorî rêbaz û pîvanên wergerandinê dimeşe yan na? Lê pîrsa herî girîngtir, gelo wergerandin zanist e yan jî huner e .....?!!

## Çiyayê Tendurekê

Çiyayê Eledaxê ber bi bakurê rojhilat ve digihêje ser Girê Gulîzar (2960 m.). Ji vir ber bi rojhilat ve erd bi derbekê bilind dibe û Çiyayê Tendurekê dest pê dike. Ji hin derve vî çiyayî hin çarî duxan bilind dibe, ji hin qelş an qelştikan germahîyêk zêde ku dest li ber nayê sekinandin derdikeve, hin çarî ji van qelşan teq û req jî tê bihîştin. Ji ber van sedemanê gotin ku ev çiyayê volkanî hîn jî tam nemiriye, ev volkanekî çalak (aktîf) e an jî di demeke ne pir kevn de çalakbûna xwe qedandiye. Gelê derdora Ebexê dibê ku ji ber van sedeman, ji vî çiyayî re, Çiyayê Cehenemê dibêjin.

Navê gundekî Milazgirê jî Tendurek (Hasretpînar) e, li bakurê rojavayê Milazgirê, li nêzîkî sînorê Kopê dimîne.

Çiyayê Tendurekê, wek girseyek bilind li qadekî piçûk girîfî ye. Li hêlekê Gîhadî û Derbenda Îpekê, li hêla rojhilatê jî Geliyê Încês û Rasta Ebexê vî çiyayî dorpêç dikin. Ji Gulîzar ber bi rojhilat ve çîya herî bilindtir dibe, li wê devere wek mitikên deveyan gir bilind dibin, zangên (krater) vî çiyayî li wê devere ne. Li hêla rojhilatê Girê Boz (Boztepe 3200 m.) heye, korta li serê vî girê fireh û kûr e, di wê kortê de golek biçûk

ji heye. Ava wê golê şêrîn, zelal û rengîn e. Ev gol bi ava berfê tije dibe. Rengê erdê li derdora wê golê boz e, ji xwelîya volkanî pêk tê.

Ji Girê Boz ber bi rojava ve çîya hinekî nizm dibe, lê piştî 5 kilometreyan bi derbekê bilind dibe, li ser Çiyayê Tendurekê çiyê herî bilind Girê Horî (3660 m.) ye. Girekî piçûk e. Ji Girê Horî ber bi rojava ve zangeke piçûk mezîn heye ku ji ya Girê Boz firehtir e. Derdora wê zangê 1300, kûrahiya wê 300, dirêjahiya ji bakur ber bi başûr 400 û ya jî rojhilat ber bi rojava ve 800 metre ye. Ev zanga sereke ya Çiyayê Tendurekê, bi axeke sor ve hatîye tuneye, tu çalakî jî li wê zangê nayê dîtin, lê bîhna kukurdê her dem jî wê zangê belav dibe. Derve yî van her du zangên mezîn (ya li Girê Boz û Girê Horî), li bakur û bakurê rojhilatê Çiyayê Boz çend zangên biçûk jî hene.

Li başûrê Çiyayê Tendurekê, çend golên biçûk li pê hev rêz dibin; yek ji van golên jî Gola Qazan e, Çemê Bendîmahî jî wê golê dest pê dike.

Derbenda Teperîzê (Çetemli Geçidi, 2600 m.), li rojhilatê Tendurekê, li ser sînorê Agirî û Wanê dimîne, rêya di nav Çaldîran û Bazîdê de di

vê derbandê re derbas dibe.

Çiyayê Tendurekê li Ebexê çiyêkî piçûk mezîn zift dike, seranserê bakur û bakurê rojavayê Ebexê qada Tendurekê ye. Seranserê başûrê Tendurekê bi kevirên volkanî yên reş nixumandî ye, ji wê de vera bi kevir re dibêjin Kirê Tendurekê, ji bayê ku ji wê hêlê (bakur) tê re jî dibêjin Bayê Kirê Tendurekê.

Tendurek ber bi hêla başûr ango Ebexê ve teqiyaye, ji ber wê yekê kevirên volkanî yên reş li hêla Ebexê rijiyane. Bi taybet derdora Seregola Jorê hemû erd wek zeviyên kevirên reş xwiya dikin.

Li ser Tendurekê du gir bilind dibin, girê hêla bakurê rojhilat hîn bilind û mezintir e. Gola Tendurekê di nabêna her du giran de dimîne, goleke mezîn û kûr e. Ji ber ku ava binê golê germtir e, ji bo wê golê wisa dibêjin: Ser av e, binî agir e. Ava golê ya hêla Ebexê sar e û bi cemax (dibe ku kukurd be) e, ji ber wê yekê diranên mirov û heywanên wê herêma ku wê avê vedixwin zû xera dibin. Ava Gola Tendurekê ya li hêla Gîyadînê dimîne germ e û bê cemax e. Li ser ava ku ji Tendurekê derdikeve û ber bi Gîyadînê diherike germav hene.

Kela Qîrniya li bakurê Seregola Jêrê



**Ebdurehman Onen**

dimîne, nêzîkî Tendurekê ye, li ser wê çaleke mezîn heye, heta ku berf bibare pez berdidinê wê çalê. 400 pez dikeve wê çalê. Li derdora Tendurekê daristan heye, lê li hêla Seregola Jêrê dar pir kêmtir in, tek-tûk darên gîzî, şîlan, bîhok û mazî hene. Çiyayê Gura Di nabêna Seregola Jorê û Seregola Jêrê de dimîne. Çiyayê Qaçê li serdestê Êgekumeytê dimîne.

Ebexê li gor gundê xwe dibe 4 herêm: Rêzegund, Gundên Rastê, Gundên Hidûd û Gundên Tendurekê.

## Peykerê Ehmedê Xanî

Fîlîzof, Helbestvan û Esmannas Ehmedê Xanî di dîroka Kurd û Kurdistanê de bi nav û deng e, lê belê em dikarin bînin Zîman ku li tevahî cîhanê, çihê wî cuda û pir girîng e.

Pêwîst e ku em jiyana wî hîn bibin, û hîn bikin, lewra der barê pêşveçûna çand, huner, wêje û zimanê Kurdî de ev hînûn pir girîng e.

Ehmedê Xanî: Di Sala 1651'ê de li bajarê Colemêrgê li gundê Xanê hatîye dinyayê. Navê bavê wî İlyas e. Navê dayîka wî Gulnîgar e. Ji eşîra Xaniyan e. Li gor agahî, zanyar û lêkolîneran, Ehmedê Xanî di sala 1707'an de li bajarê Bazîdê... Kurdava di temenê xwe yî “57”salî de ji yana xwe jî dest da.

Ehmedê Xanî gelek astengî û zor-darî di jiyana xwe de dîtibû ji aliyê dagirkerê Kurdistanê Tirk û Firis, Mixabin heta berhemen wî jî bindest bûn, lawera gelek ji berhemen wî nehatine çapkirin û parvekirin di nav gel de.. Her çend em ser jîyan û berhemen, Ehmedê Xanî biavaxin û binivîsîn hîj hindik e.

Li bajarê (Bazîdê, bi kurdî, Kur-dava) jî aliye şaredariya “BDP” ve berî çend salan, paykerê Ehmedê Xanî hatibû çêkirin, lê Mixabin heta ew paykera jî bindest



**Rizgar Hiso**

bû, xistin di bin lîngan û jî aliye dewleta Turkyê ve hate Xirakirin, û hilweşandin, her wiha berî demekê di weşanxaneyekî de li bakurê Kurdistanê gelek pirtûkên Ehmedê Xanî, hatibûn şewitandin.

Ev jî nîşaneke e ku hemû kes bi taybetî rêjîma Turkyê li dijî tevahîya Kurdan e. Li dij mafê kurd û Kurdistanê ye, ta ku kurd negihîjin heq û mafê xwe.

Helbestine Bijartî...Narîn Umer

Dilê Tiliyan

Dilê tiliyên min
Avzê m dibe
Di dema germî û
sermayê de
Bêriya silava
destê te kirye.

Lerzandina Dil

Niknika baranê
Li pencerê di wê şevê de
Tevlî çikçika tiliyên te dibû
Tiketika larzandinê
Dîlana Koçerî û Botanî
Li ser ritma dil
Geştir dikir û bi tevzînokên
bahozê re
Tevizandina kenê me
Bi hêz û bizav dibû
Belê
Barana dil

Narîn Umer, nivîskar û
helbestvana Kurd e.
Di sala 1967'an de li Dêrika
rojavayê Kurdistanê ji
dayîka bûye.
Xwendina xwe ya seretayê,
amadehî û navendî li
dibistanên Dêrikê qedandi-
ye, paşê li Zanîngeha Şamê
(Wêjeya Erebî) xwend, û di
sala 1995'an de xwendina
xwe bi dawî kir û der çû...

Mîna sirûştê xakê
Rengereng dibe
Piyama dilovaniyê
Dirêse û belav dike
Dibêje
Dil xweze ye
Xweze dilê evîniyê
Rengîn dike.

Ferheng

Ma raste
Dema min
Nehatiye
Ku tu navê min
Bi dirustî di nav
Dilê rûpelên xwe de
Bikolî !!!?

Helbest

Berhemên
Ramangehên te
Hasten sazvanan miştin
Aramî û samanî
Lewra..
Sazbendên Cîhanê
Bi tevayî
Navê te
Li ser rengê
Sirûştê
Diçînin

Nan

Nan bêriya
Henasên diya min
Di tenûra taxa me de
Dike û
Min
Bêriya nanê
Bi şekir û rûn
Kiriye.

Biyani

Serma Havînê
Bahoza Payîzê
Birûskên Biharê
Ziwabûna Zivistanê
Ew in biyanî.

Dastan

Eger Ehmedê Xanî
Pênûsa hebûna navê xwe
Nekolaba
Li ser eniya mayîne
Wateyên navê te
Dastana min
Bi çî şeweyî wê xwe anîban
Ziman!?

Baran

Baran sor e
Çav razayî ne
Ez bê çeng kirim
Wê bihara bê dem.
Pirpirîk
Di xewnan de
Pora min dixwerîne
Tiliyên pirpirîka
Bajarê min.

Dêr

Rojbûn e
Kulîlk vedibin
Bi min re diken
Dêra taxa kevin.

Narîn Umer, ji hêla
hevgirtin û kombûnên
rewşnebîran, çî li ser asta
xwechî be, çî jî li ser asta
cîhanî be, bi dehan ji ba-
wername û xelatan wergir-
tine...


Felaketa Qamişlo

Çî narvîna me t,bêcan î
Ne dil pak û dilovan î
Di dermafên me bê ol î
Tu yî dilmij tû human î
Felaket l,pey felaket tê
Hejarî û perîşanî
Li Qamişlo birîn kûrbûn
li goristan e şehyanî
Sedê malan xirab cih bûn
Siha konan li cih danî
Piçûk û pîr wekî hev çûn

Siwar bûn pêleyên janî
Li hawarên me kerdeng in
Hemî jîndar û cîhanî
Dibêjin kurd ne yek dest in
Ne yek armanc û nîşanî
Dibêjin ew kewa dînin
Li hev nakin tu caranî
Erê kurdno demeyzînin
Nerîna dijminan kanî
Gelê kurdan dibînin ew
Neyarên wa neda, b zanî
Erê kurdno.. Erê kurdno
Felaket tê bişopanî

Leyla Qasim

Leyla Qasim serûk hilda
Gula jînê bi lez gul da
Daristanê çiqil der kir
Dara azadiyê pel da
Derzîdanka kulîka dil
Ayîna dil ji dil dil da
Çavê rizgariyê bel bûn
Gava Leyla me çav kil da
Avrêja hiş xunav wer kir
Kêşa serkeftinê hilda
Înana Kurd bi coş gur bû
Navbirka rastiye kel da
Keçka Kurdan bi şehnazî
Payabûna xwe zengil da



Dozê deng da bi wê Alê
Xaka Kurdan çî simbil da
Leyla Qasim lehinga pak
Dîrokê bo te rûpel da

Newroz

Buhar tê pê re tê Avdar
Semadar in kulîlk û dar
Gelê Kurdan bi şêranî
Dixemlînin dilê mestyar
Li benda wê miradên me
Mirada em kirîn navdar
Xetîrên agirî wek ar
Hesinkarê xwedî halan
Bi halanî dikir hawar
Erê kurdno bi şehyanî
Em ê çêkin Welat û war
Ve roja nû helat û hat
Bi Newrozê me kuşt zordar
Wiha Kawa gelê bindest
Ji xewna reş kirin hişyar
Hezar caran em ê bêjin
Bijî Newroz mebesta zar
Erê Kawa lehingê merd

Dimîni simbol u şahyar

Welato

Kenê çavan kenê lêvan
Nerînên dill dikin mêvan
Pevokên xweş bi wan xweş
tân
Demarên wate bûn rêvan
Ne poşman im ji vê işqê
Sipasdar im ji van lêvan

Narîn Umer ji
jinên pêşeng e li Roja-
va ku dest bi nivîsandina
bi zimanê dayîkê kiriye...
Helbest,çirok û romanê
dinivîse, û giraniyê dide
ronîkirin û belgekirina ji-
yana navdarên jin ên Kur-
dan û gelek lêkolîn û nivê-
s di vî barî de belav kirine.

Welato her dimîni xweş
Buhîşt î tu ez im sêwan
Bimîni war ji bo Kurdan
Tu yî sîber tu yî sêwan

Roj baş


Çaxê te geş bî dayê
Bandor dida dinyayê
Roja te xweş bî babo
Va rojeka nû çêbû
Dayka me ya jêhatî
Tev bûne serpehatî
Rewşa jiyana dilşad
Peyvê te yên cîvanok
Sing û ber in çav kanî
Helbet tû xemla xanî
Dayê sirûda canî
Istaneya mayîni
Bûyî dilê gerdûnê
rextê me yên ezmûnê
bavê me yê dîtinxweş
Helwest û ramanên rast
Bare giran tê rakî
Yabo tû yî ronak î
Yabo çeleng û pak î
Pînahiya çavan î
Em tirhik in bo wana
Rengîn dikin bistana
Dayîk û bav darşin in
Herdem bi reng û bîn in
Dema min dest ji wê berda
Belav kir nameya Kurda
Firoka min bilind firda



Li asoyên bilind gerya
Duyem daxwaz dilovanî



Ne mayîna bi hovanî
Yekem daxwaz mirovanî
Hedanîna bi azadî
Bidin doza me guhdanê
Bidin pîvan u dengdanê
Dixwazin em ji cîhanê
Li van mafê me haydar bin
Şeva tarî li gel dada



Zemanê nû bi lez rada
Firoka min li jor bada
Bi aştxwaziye serket
Nerînên gel bi dest girtin
Nema bindestî û girtin
Mirovan name wergirtin
Jiyana baş bi dest anîn

Çemê Dîcla

Meqamên rengereng tîni
Bi çavên geş dimeyziñi
Kulîlkin jê re rengîn î
Peyalên zer dineqşîni
Tu temtêl î tu raxwîn î
Erê çawa dinexîni
Bi bircan tê te dengîni
Dibî rêzdar û navîn î
Ji bo dîtna te xwezgîn î
Bi min xweş tê te avîni
Tu yê Xeyda bixeydîni
Tu alav î tu nûjîn î
Kela giryê min dertîni
Bi awazên xwe zengîn î
Ez im Mem can tu yî Zîn î
Dimalim jan û xemgînî
Çemê Decla newa vîn î
Silavên xweş ji kû hatin
Silavên Dêrka Hemko
Meya Indîwerê kef da
Demarên dil semadar in
Buhar zû tê li canê min

Pira Bafid resen text î
Kevanên kevneşop rewş in
Ciwan û kal buharvan in
Ji Xeydayê vexwim avê
Eger çavên te bê coş bin
Bijî Decla çemê jînê
Kenê pêlên te dijwar hat
Tu jî wek min evîndar î
Dibêjî min temenxort im
Bi van peyvan dibim Basûrv

Dayê

Gava ji xew radibim ez
Rengê te yê pak dibînim
Lêvên te kêfê dibarin
Tîpên vejîne diçînim
Dengê te yê nerm û sazjîn
Ritma dilî jê dixwînim

Ji bilî wê jî, Narîn bi da-
neheva zargotina Kurdî jî
xerîk dibe, gelek berhemên
wê yên çapkirî û destnivîs
jî hene...

Tiliyên te hevrîsm e dayê
Ser dêmenê can de tînim
Çavên xwe digrim de razim
Rayên mejî dadgerînim
Yadê buhusta te yan ez
Xwenek buhustî dibînim
Wenda me tarî perês im
Yan ez Emîrê Zemîn im
Çaxê li pêlan disopim
Peyvên te her ez dixwînim
Çîrok û bîrok li bal in
Dîsa bi lez vedgerînim
Dîdargeha şîretan î
Lewra xwe zîrek dibînim
Hestên te ronîfîros in
Konê reşiyê d'birînim
Mesta berê singvexwar im
Şadî me ez xemrevîn im
Ta ez bi serbest binoşim
Saza Zimanan b'firînim
Dîya min î xwes mirov im
Navê te ez pê dimînim.

Kurdî Xweş e.

Xwedawend	آله
Peyrew	تابع صوفي
Xweragêr	صامد
Berxwedêr	مقاوم
Rêzname	بطاقة شكر
Şeşber	مسدس
Mayînde	باقي
Pîrozmend	مقدس
Sawêr	خيال
Jêrmal	قلبو

Gotinên Pêşyan

- Eyd tê, xêr û bêr pê re tê
- Eyd e, bê qeyd e
- Here wê derê ku guh bidin te
- Keda helal şîrîn e
- Ava bin kayê, deng jê nayê
- Li gel neyaran neçe beyaran
- Nefsa bilind mirov nizam dike
- Tifing hat, mêranî hilhat
- Yê ji Xwedê natirse, jê bitirse
- Jina qenc buhişt e

Pirsname

Sirûda Keçan a bi navê Herne Pêş, a kîjan helbestvanî ye? Yekem pakrewanê rojavayê Kurdistanê?

Bersiva Pirsên Çûyî

Seydayê Bêbuhar(Yûsiv Berazî) Di sala 2009'an de koça dawî kir Yekem dibistana Kurdî li devera Cizîrê, li gundê Til Şî'ra Aştîtan bû

Mamîk

- 1-Vekirî kon e, girtî gopal e.Çi ye
- 2-Binî ax e, nêvî şax e, serî zêr e...

Bersiva Mamikên Çûyî

- 1-Pora li ser serî ye
- 2-Bişkul

Xaçpîrs

	1	2	3	4	5	6	7	8	9
1			■						
2						■	■		
3				■				■	
4					■	■			
5	■	■	■						
6									
7								■	
8				■					
9	■	■	■						

Sitûnî

- 1\_Paşnavê evîndarê Zînê\_Bismar
- 2\_Ne dagirtî\_Agir(Vajî)
- 3\_Bê ziman\_Bêjeyê xweşînê
- 4\_Cinavkeke pirjimar\_Welatê ku Rojhilatê Kurdistanê dagir kiriye
- 5\_Cihê ku genim lê tê hêran\_Dijmin+Ne
- 6\_Erdê rast, havîngêh
- 7\_Du tîpên wekhev\_Ked+r belavkirî
- 8\_Jina ku mêrê wê miriye(Vajî)
- 9\_Welatê Kurdan(Vajî)

Asoyî

- 1\_Pêdiviyê jiyane\_Bajarekî bakurê Kurdistanê
- 2\_Perestgeha Êzîdîyan\_Hêzeke xwezayê
- 3\_Navekî Erebî yê keçan\_Du tîpên wekhev
- 4\_Dengê ji ber êşê\_Alava palevanan
- 5\_Ajalekî ku bar lê tê kirin(Vajî)\_Du tîpên wekhev
- 6\_Navê ajaleke şîrdar\_Behir bi Kurdî(Vajî)
- 7\_Raperin belavkirî
- 8\_Ax\_Welatekî Erebî(Vajî)
- 9\_Bajarekî başûrê Kurdistanê

Biçûktirîn û Mezintirîn Serok Di Cîhanê De...Nas Bike!

Îmanwêl Makron ku bi temenê xwe 39 e, biçûktirîn serok di diroka Ferensayê de ye, ku heye 170 sal di pişt Napilyonê 40 salî re, tu kesê biçûktir nebûbû serokê Ferensayê. Lê belê Makron ne biçûktirîn serok di cîhanê de ye, ji ber Seroka San Rîmo, Fanîsa Dî Emporsyo ku 29 salî ye, biçûktirîn serok e di cîhanê de. Duyemîn biçûktirîn serok, serokê Kûryaya Bakûr, Kîm Cong On e, ku temenê wî 34 e. Berevajî wê, mezintirîn serok di cîhanê de, serokê Zîmbabwê, Robert Mogabî ye ku bi temenê xwe 93 sal e. Tiştê balkêş ew e ku, Mogabî her dibêje” Ta ku gel min bixwaze, ez ê bimînim serok”

Karîkatêr



Bêdengiya Cîhanê


Pêkenok

Yekî gundî ji boyî ku êzingan bîne diçe darîstanê. Di vegeerê de nêzikî gund, kerê wî ji cihekî bilind dikeve û lingê wî dişikê. Hema yê gundî bi çeka xwe guleyan diavêje û ji gund hawarê dixwaze. Gundî hemû tîn hawara

wî û jê pîrs dikin: -Çi bûye? Wiha vegeerand: - Kerê min ji wê dera bilind halo ket û lingê wê halo şikest. Gundîyan gotê: - Ji ber vê çendê te banî me kir?

Ez Halo Ketim!

Got: - Erê, ne wilo bûya hewe dê yek-yek ji min pîrs biki- ra ka bûyer çawa çêbûye. Diviya min jî yek-yek bersiva hewe dabûya. Ev e hewe tevan bersiva xwe bi hev re stand.



Serpêhatî



Namûs Ji Her Kesî Nayê

Dibêjin gurekî pîr hebû nema karîbû seyd û nêçîrê bike. Hat li ber kendalekî pal da. Dît gurek hat cemê jê pîrsî: Apo tu li ber vê kendalê çi dikî?. Gurê pîr lê vegeerand û got: Lawê min ez pîr bûme nema nêçîr ji min tê, ji birçîna min li ber vê kendalê paldaye. Gurê ciwan jê re got: Ez çavên te me anha ez ê herim mihekî tev li dawa wî ji te re binim. Gurê pîr got: Ma tu ji kîjan malbatê ye. Gurê ciwan got: Ez ji pişt-reşa me. Gurê pîr got: Bi xwedê pişt-reşa tu namûs nekîrine ka ez te bibînim. Gurê ciwan dada kerîk pez, kûçikê şivanan lê vehewiyan û ser wî danîn. Gurê ciwan reviya û di ber gurê pîr re derbas bû. Kûçika devj wî berdan û berê xwe dan gurê pîr dev lê kirin, laşê wî tev kirin birîn. Deh rojan birînen xwe alastin heya rehet bû.

Paşê gurekî dî hat cem û jê pîrsî: Apo tu li vir çi dikî?. Gurê pîr çiroka xwe û gurê dî jê re got. Gur got: Apo xema mexwe ez çavên te me anha ne dereng ez ê te têt goşt bikim. Gurê pîr jê pîrsî ma tu ji kîjan malbatê yî. Gur jê re got ez ji malbata piştşîna me. Gurê pîr got: Bi xwedê lawo hûn yên namûs û xîretê ne. Gur çû dada kerîk pez mihek qelew girt û ji gurê pîr re anî. Gurê pîr ket ser goşt. Çend rojan têt xwar, quweta wî hate ber wî û rabû serxwe. Herwekî Tîrêj gotiye: Xwedî fort û pesin jê mek tu hêvî Dema bêje ez im gernas û şevger Tu car ew nabe xwedî go-tina xwe Tu bawer be çiqil nagre cihê şêr.

Bersiva Xaçpîrsa Çûyî

	1	2	3	4	5	6	7	8	9
1	a	l	î	h	e	r	î	r	î
2	r	a	k	e	t	i	n	■	n
3	a	l	î	k	a	r	î	■	a
4	m	e	■	a	t	a	■	t	t
5	■	ş	■	r	u	m	a	n	î
6	z	■	ş	î	r	■	m	a	m
7	a	p	■	k	i	r	î	■	■
8	x	ê	r	■	■	i	e	m	r
9	o	l	p	e	r	i	s	t	■